

Zimanê min, Welatê min

Pêşniyaz bo baştirkirina rewşa edebiyata kurdî li welatên Bakurî

Amadekar: Husein Muhammed



www.kulttuuriaikaille.fi
www.kulturforalla.fi
www.cultureforall.fi

Çand ji bo her kesî -karûbarên weşanên 1/2020 (Kulttuuria kaikille -palvelun julkaisuja 1/2020)

Weşanxane: Kulttuuria kaikille -palvelu / Yhdenvertaisen kulttuurin puolesta ry (Çand ji bo her kesî – Karûbar- xizmet / Komela Ji bo Çandeyên wekhev)

Nivîskar: Husein Muhammed

Nûçevan: Rita Paqvalén

Beşa 1' emîn

ISBN 978-952-6677-57-6 (DOC)

ISBN 978-952-6677-58-3 (PDF)

ISSN 2341-913X

Naverok

Pêşgotin	4
1. Çima raporek li ser edebiyata kurdî li Welatên Bakurî?	6
Metodolojî	8
Kurd, zimanê kurdî û edebiyata kurdî kurdî bi kurdî	10
Kurd û edebiyata kurdî li welatên Bakurî	13
2. Rewşa niha û zehmetî.....	15
Meydana edebiyata kurdî li welatên Bakurî.....	15
Cûreyên edebiyatê.....	16
Ziman	16
Rewşa jiyane	16
Çi edebiyat li welatên Bakurî li kurdî tê wergerandin?.....	18
Weşandina edebiyata kurdî.....	19
Xwegihandin xwandevevanan.....	21
Têkilî li gel welatên jê hatî	23
Danûstandin û hevkarî li gel nivîskarên din	25
3. Pêşniyaz	27
Bîbliyografya	30
Dezgehên kurdî yên kultûrî li welatên Bakurî.....	32
Husein Muhammed	34
Rapirsî (kurmançî).....	35
Questionnaire (inglîzî)	39
پرسی (sorani)	43
Frågeformulär (swêdî)	46

Pêşgotin

Ev rapora di destê we de derbarê rewşa edebiyata kurdî li welatên Bakurî ye.

Li dema Serokatiya Fînlandayê di Encumena Wezîran ya Welatên Bakurî de 2016, wezareta karûbarên civakî û tenduristiyê li gel wezareta perwerde û kultûrê û wezareta karûbarên aborî û pêşxistinê dest bi projeyeke bi navê “Devereke Bakurî ya vekirî û nûxwaz li gel mirovên halxweş li 2020 – Derfetên wekhev bo xweşguzarî, perwerde, kultûr û kar” (Norden 2020).

Refah, wekhevî û hevtayî, dewlemendiya kultûrî û pêşketina mayinde ya civakî mijarên tev-kertî yên vê projeya sêsalî (2016-2018) ne. Çalakiyên cuda (seminar, konferans û rapor) di projeya Norden 2020 de bi armanca pêşxistina civakên refahî yên Bakurî û rakirina astengiyên li ber pêşketin û biserketinên ayindeyê ne wek ku her pênc welatan qebûl kirine: Danîmarka, Fînlanda, Norwec û Swêdê li gel Grînlanda, Giravên Ferî û Alandayê.

Devera Bakurî niha rû-bi-rûyî hin guherînên bingehîn yên binesazî û demografîkî ye wek li seranserî hemû dinyayê jî. Avaniya temenî li welatên Bakurî û dabînkirina refahê, ayindeya karkirinê û geremolên siyaseta navneteweyî û koçberî hinek mijarên serekî ne ku tesîrê li jiyana û siyaseta vê deverê dikin.

Yek ji mijarên jêrîn yên projeya Norden 2020 pirzimanîti li welatên Bakurî ye. Ev mijar di bin navê projeya “Pirzimanîti û cihêrengî wek çavkanî li meydana kultûrî – karkirin û integrasyon bi rêya edebiyatê li welatên Bakurî” ku ji aliyê Xizmeta Kultûr Bo Hemûyan ve tê birêvebirin û budjeya wê ji aliyê Encumena Wezîran ya Bakurî ve hatiye dabînkirin. Proje giringiyê dide mafên zimanî yên nivîskar û xwandevanan û diyaloga navbera kultûran bi rêya edebiyatê. Ew dezgeh, proje û rêkarên ji welatên cuda yên Bakurî tîne pêş û piştgiriya hevkarîya wan dike. Hinek ji armancên konkret yên projeyê komkirin û parvekirina agahiyên li ser şarezatiya pirzimanî li welatên Bakurî, birêvebirin û pêşxistina Meha Pirzimanî ya Bakurî (21 sibat – 21 adar, salane) û amadekirina raporên li ser edebiyata bi zimanên cuda li welatên Bakurî ye.

Ev rapor, *Zimanê Zimanê min, Welatê min. Pêşniyaz bo baştirkirina rewşa edebiyata kurdî li welatên Bakurî*, sêyem rapora derbarê zimanekî ye ku ev proje derdixe. Ev lêkolîne rewşa edebiyata kurdî li welatên cuda yên Bakurî dide nasîn, pirsgerêkên wê yên serekî radixe ber çavan û pêşniyazan bo baştirkirina rewşê pêşkêş dike. Di raporê de 8 pêşniyaz tên kirin bo çawaiya bihêztirkirina edebiyata kurdî li welatên Bakurî.

Kirsi-Marja Lehtelä

Plandanera serekî

Dezgeha Neteweyî ya Tenduristî û Refahê

Rita Paqvalén

Birêvebera giştî

Xizmeta Kultûr bo Hemûyan

1. Çima raporek li ser edebiyata kurdî li Welatên Bakurî?

Bi hejmara qisekeran, kurdî yek ji zimanên serekî yên koçberan e li Danîmarkayê, Fînlandayê, Norwecê û Swêdê. Li Swêdê ew pêncemîn e piştî swêdî, fînlandî, sirbokroatî û erebî¹ û ji aliyê nêzîk 100 000 kesan ve tê axiftin.² Li Fînlandayê kurdî ji aliyê zêdetirî 13 000 kesan vet ê peyivîn³ û zimanê heftemîn e piştî fînlandî, swêdî, rûsî, estonî, erebî û somalî. Li Norwecê jî ew yek ji zimanên serekî yên koçberan e.⁴ Li Danîmarkayê ti statîkên fermi yê zimanên navmalan nînin. Lê dîsan jî, li wê derê jî, li ser bingehê welatên jêhatina koçberan, kurdî di zimanên serekî yên koçberan de ye û ji aliyê nêzîkî 30 000 kesan ve tê qisekirin.⁵

Herêma kurdînişîn li Rojhilata Navîn anku Kurdistan ji aliyê siyasî ve hatiye parvekirin di navbera Îran, Iraq, Sûriye û Tirkîyê de. Kurd li van dewletan kêmine ne û mafê wan yê jiyana li gor kultûra xwe, di nav de jî danûstandina bi zimanê xwe, bi giranî bisinorkirî bûye.⁶ Kurdên li welatên Bakurî (Skandinavyayê) dijîn ji hemû wan welatên binavkirî ne. Wek gelek komên din jî yên koçber, koçberên kurd li welatên Bakurî bi cih bûne, gelek ji ber sebebên siyasî û emnî, hinek jî bi armanca peydakirina kar. Ji ber bisinorkirinê dijwar dijî ziman û kultûra kurdî li Kurdistan – niha bi taybetî li Tirkîye û Îranê lê berê herwiha li Iraq û Sûriyê jî – gelek kurd revîne Ewropayê, welatên Bakurî jî, daku bikarin nasnameya xwe ya kurdî biparêzin û bo nimûne bi azadî zimanê xwe bi kar bînin.

Ev bi taybetî bo nivîskarên kurd giring e. Çapkirina berhemên kurdî bi temamî qedexê bû li Tirkîyê heta salên 1990.⁷ Tevî ku bi temamî ne qedexê bû jî li Îran, Iraq û Sûriyê, li van welatan jî gelek bisinorkirinê dijwar hebûn – û heta niha jî berdewam in – li ser bikaranîna zimanê kurdî li meydana giştî, bo nimûne di perwerde, bazirganî û weşangeriyê de.⁸

¹ Språken i Sverige (Ziman li Swêdê) <https://www.sprakochfolkminnen.se/om-oss/for-dig-i-skolan/sprak-for-dig-i-skolan/spraken-i-sverige.html> (bi swêdî). Binêrin herwiha *Språktidningen* 2/2018 at <http://spraktidningen.se> (ew jî bi swêdî).

² Kurder i Sverige (Kurd li Swêdê): https://sv.wikipedia.org/wiki/Kurder_i_Sverige (bi swêdî).

³ Suurimmat vieraskielisten määärät (Largest groups of foreign-language speakers): http://vertinet2.stat.fi/verti/graph/Graphserver.htm?ifile=quicktables/Maahanmuuttajat/kieli_2&lang=3&x=540&gsk_ey=2 (bi fînlandî).

⁴ Country Report on multilingual issues: Norway: <http://www.mek.oszk.hu/minerva/html/dok/norway.pdf>

⁵ Kurdere i Denmark (Kurds in Denmark) <https://jyllands-posten.dk/indland/ECE5105449/Fakta-Kurdere-i-Danmark/> <https://www.information.dk/kultur/2007/08/danmarks-stoerste-sprog> or <https://jiyan.dk/2011/10/hvor-mange-kurdere-bor-der-i-danmark/> (all in Danish).

⁶ Skutnabb-Kangas, Tove & Phillipson, Robert (1993): Linguistic Rights for the Kurds. https://www.academia.edu/32244233/LINGUISTICHUMAN_RIGHTSFOR_THE_KURDS

⁷ Ibid.

⁸ UNPO report: Iranian Kurdistan: Restriction On Use of Minority Languages: <http://www.unpo.org/article/15402>

Bi taybetî piştî inqilaba leşkerî ya Tirkîyê sala 1980,⁹ gelek nivîskarên kurd ji Tirkîyê derketin. Hinek li Fransayê, hinek li Almanyayê yan Brîtanayê lê piraniya wan li Swêdê bi cih bûn – herwiha hejmarek li Danîmarkayê, Fînlândayê û Norwecê. Pêla duyemîn ya nivîskarên kurd salên 1990 gihîşt, vê care ji Iraq û Îranê. Pêla sêyemîn jî vê dawiyê ji şerê navxweyî yê Sûriyê ku 2011 dest pê kiriye tên welatên Bakurî.

Serdemeke çalak di edebiyata kurdî de li welatên Bakurî dest pê kir salên 1980 gava ku helbestvanên wek Cegerxwîn (1903 – 1984), romannivîsên wek Mehmed Uzun (1953 – 2007) û nivîskarên edebiyata zarokan wek Mehmed Emîn Bozarslan (1935 –) dest bi çapkirina kitêbên xwe kir li Swêdê. Salên 1990, gava ku ziman û edebiyata kurdî hê jî li Kurdistanê bi giranî bisinorkirî li bin zextan bû, 10-12 kovarên edebî û kultûrî li Swêdê derketin, hinek jê kêmtir û hinek zêdetir bi berdewamî.¹⁰ Bi sedan, eger ne bi hezaran, kitêbên bi sernavên cuda bi piranî li Swêdê¹¹ lê piçek jî li Danîmarkayê û Norwecê hatin weşandin. Nivîskarên kurd komeleyeke nivîskaran li Swêdê¹² damezrandiye û herwiha kitêbxaneyek li Stockholmê daniye bo berhevkirin û pêşkêşkirina materyalên bi kurdî li ser kurdan bi zimanên din.¹³

Weşangeriya bi kurdî mixabin van salên dawiyê li welatên Bakurî daketiye.¹⁴ Beşek ji vê ji ber serhildana weşangeriya dijîtal e û herwiha ji ber baştirbûneke demkurt ya îmkânên edebiyata kurdî li Kurdistana Iraqê û ya Tirkîyê.¹⁵ Sebebekî din jî ew e ku nifşê nû, anku kesên li welatên Bakurî mezinbûyî û perwerdekirî, bi piranî bi zimanên fermî yên wan welatan dixwînin û dinivîsin.

Tevî ku kurd bi rêjeyî komeke nû ya kêmnîyan in li welatên Bakurî, dîsa jî edebiyata kurdî li van welatan xwedî dîrokeke çalakiyan ya çendîn dehsalan e bi çapkirina bi sedan kitêban û weşandina bi dehan kovaran û herwiha kitêbxaneyekê û komeleyeke nivîskaran. Li aliyekî din, niha ti kovareke kurdî bi berdewamî li welatên Bakurî naweşe, piraniya çapxaneyan hatine girtin û heta kitêbxaneyayê kurdî jî di bin gefa girtinê de ye.¹⁶

⁹ Turkish military coup of 1980: https://en.wikipedia.org/wiki/1980_Turkish_coup_d%27%C3%A9tat

¹⁰ Li Swêdê Kovargeriya Kurdî: <http://www.kulturname.com/?p=5017>

¹¹ Sweden; home of the Kurdish books in exile: <http://www.rudaw.net/english/culture/080620161>

¹² Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê (Kurdish Writers' Union in Sweden): <http://niviskar.se>

¹³ Kitêbxaneyayê Kurdî li Stockholmê: <http://kurdlib.org/>

¹⁴ Sweden; home of the Kurdish books in exile: <http://www.rudaw.net/english/culture/080620161>

¹⁵ Li ser zehmetiyên niha li parçeyên cuda yên Kurdistanê, li jêtir binêrin.

¹⁶ Kurdiska Biblioteket fyller år – Stötta Kurdiska Biblioteket (Kitêbxaneyayê Kurdî salvegera xwe pîroz dike – alîkariya wê bikin): <https://foreningenbis.com/2017/10/09/kurdiska-biblioteket-fyller-ar-stotta-kurdiska-bibliotek/> (bi swêdî).

Kurte dîroka edebiyata kurdî li welatên Bakurî nimûneyeke lêkolînê ya baş e ku çawa edebiyateke kê mîneyan yan koçberan dikare vejî yan dakeve – û bi taybetî çawa ew dikare were vejandin û rê li ber daketina wê were girtin. Parastin û pêşvebirina edebiyata kurdî hewcedarî hinek insiyatîvên nû ye. Ev lêkolîn rewşa giştî ya nivîskarên kurd li welatên Bakurî radixe ber çavan û herwiha hinek pêşniyazên bo baştirkirina rewşa wan pêşkêş dike.

Metodolojî

Ev sêyemîn rapora taybetî li ser edebiyata zimanekî ne-serdest e li welatên Bakurî, ku ji aliyê dezgeha Kultûr bo Hemûyan¹⁷ ve hatiye daxwazkirin wek beşek ji projeya Pirzimanîti û piralîti wek

¹⁷ Kultûr bo Hemûyan: <http://www.kulttuuriakaikille.fi/>

serekaniyekê li meydana kultûrî – bikarkirin û bikêranîn bi rêya edebiyatê li welatên Bakurî¹⁸. Armanca vê raporê lêkolîna li ser edebiyata kurdî li welatên Bakurî ye. Ev rapor çavkaniyên xwe ji berhemên çapkirî û internetî û herwiha ji pirsname û hevpeyvînan digire.

Agahiyên giştî li ser kurdan, zimanê(n) wan û edebiyata kurdî ya di raporê de pêşkêşkirî ji kitêb, nivîsar û malperên cuda-cuda ye. Hem materyalên çapkirî û hem jî yên elektronîkî yên inglîzî û kurdî hatine wergirtin. Ji ber ku bi eslê xwe rapor bo xwandevanên inglîzî hatiye pêşkêşkirin, piraniya amajeyan bo materyalên elektronî yên bi inglîzî ye.

Di lêkolîna rewşa niha ya edebiyata kurdî li welatên Bakurî de, metoda serekî pirsnameyek hevpeyvînên li gel nivîskar, wergêr, weşanger û çapkerên kurdî ye ku li welatên Bakurî dijîn.

Pirsnameyek bi kurdî (hem bi kurmancî û hem jî bi soranî), inglîzî, swêdî û fînlandî hat şandin bo 73 kes û dezgehên peywendîdar. Hemû versiyonên pirsnameyê bi wan ziman bi vê raporê ve hatine zeliqandin. 46 pirsnameyên bi temamî yan bi pişkî bersivdayî hat vegerandin, hemû bi kurdî (31 bi kurmancî, 15 bi soranî. 24 bersiv ji Swêdê hatin, 8 ji Fînlandayê, 7 Danîmarkayê û 5 ji Norwecê. Du bersiv ji Kurdistana Iraqê hatine, ji du nivîskaran ku got ew niha beşekê li Kurdistanê û beşekê jî li Swêdê dijîn. 13 bersivderan li ser pirsnameyê got “jin”, 27 “mêr”, yên din bersiva pirsnameyê neda.

Hemû bersivder li herêmên kurdînişîn yên Tirkiyê, Îranê, Iraqê yan Sûriyê hatibûn dinyayê, ji bilî du kesan ku li Ermenistanê ji dayik bûbûn ku li wê derê jî hejmareke giring ya kurdan heye. 12 bersivder li welatên Bakurî bi cih bûbûn salên 1980; 16 li salên 1990; 11 li salên 2000 û 7 li salên 2010. Ji bilî sê kesan, hemû bersivderan hejmara telefona xwe da û paşî têkilî li gel wan hat danîn bo gotûbêjkirineke berfirehtir li ser edebiyata kurdî li welatên Bakurî. Ji 43 kesên têkilî pê re kirî, gihîştim 37 kesan û bi telefonê li gel wan axivîm.

Meha gulana 2018 sefereke du-rojî hat kirin ji Helsinkî bo Kopenhagê bi mebesta hevpeyvîndina çar nivîskar û/yan wergêrên edebî yên kurdî. Hevpeyvînên takekesî hatin encamdan li gel sê nivîskaran. Hevpeyvîneke plankirî nehat kirin ji ber guherîna demê kesê hevpeyvîndî, û ew hevpeyvîna paşî bi rêya vîdyoyê ji Helsinkî hat kirin. Meha îlona 2018 sefereke du-rojî hat kirin ji Helsinkî bo Stockholmê bi mebesta hevpeyvîndina nivîskar, wergêr û weşangerên kurd. Li gel du nivîskaran bi takekesî hevpeyvîna hat kirin, paşî li gel du nivîskar û du wergêrên pêkve û paşî li gel

¹⁸ Multilingualism and diversity as a resource in the cultural field – employment and integration through literature in the Nordic Countries: <http://www.kulttuuriakikille.fi/en.php?k=15369>

weşangerekî bi takekesî. Herwiha serdana Kitêbxaneya Kurdî¹⁹ li Stockholmê hat kirin û birêveberê wê hat hevpeyvandina. Têkilî li gel her heşt bersivderên Fîlandayê hat kirin bi rû-bi-rû havîna 2018: çar li Helsinkî û derdorên wê, sê li Turku û yek li Lahti. Hevpeyvîn li gel her çar bersivderên Norwecê jî hat kirin yek-bi-yek li ser telefonê, çar ji wan bi rêya vîdyotelefonê.

Bersivên nivîskî û devkî û nêrînên di hevpeyvînan de pêşkêşkirî hatine kurtkirin di beşa “Rewşa niha û zehmetî” û herwiha beşa “Pêşniyaz” de.

KURD, ZIMANÊ KURDÎ Û EDEBIYATA KURDÎ BI KURTÎ

Kurd komeke etnîkî, kultûrî û zimanî ya texmînen 30 heta 40 milyon²⁰ kesî ye ku bi piranî li Kurdistanê dijî ku devereke cografî ya parvekirî ye di navbera sinorên navneteweyî yên Iraq, Îran, Sûriye û Tirkiyê

¹⁹ Kitêbxaneya Kurdî li Stockholmê: <http://kurdlib.org/>

²⁰ The World Fact Book, <https://www.cia.gov/library/publications/the-world-factbook/index.html>

de. Herwiha texmînen 2 milyon kurd li derveyê Kurdistanê dijîn, bi taybetî li Ewropayê, hinek ji ber koçberiya bi zor û hinek jî ya dilxwazane ya van çend dehsalên dawiyê.²¹

Zimanê xwemalî yê kurdan zimanê kurdî²² ye ku yek ji zimanên îranî yên ji binemala zimanên hindûewropî ye. Ew ne têkildarî zimanên cîran, erebî (zimanekî samî) û tirkî (zimanekî altayî) ye. Ew têkildarî zimanê resmî yê Îranê anku farisî ye lê kurdî û farisî ne ji herdu aliyan ve nayên têgihiştin.

Zimanê (yan zimanên) kurdî ji sê komên serekî yên lehceyan pêk tê: bakurî (kurmancî), navendî (sorani) û başûrî (ku bi navên cuda tê nasîn, wek feylî, kelhurî, kirmaşanî û hwd.) Ev komên cuda yên lehceyî herdem ji hev nayên têgiştin û fehmkirin û heta hin caran ew wek zimanên cuda jî tên hesabandin.²³

Kurmancî zimanê xwemalî yê bi kêmî niv ji kurdan e (15 ta 20 milyon).²⁴ Ew ji aliyê hemû kurdên Sûriyê, piraniya kurdên Tirkîyê û kêmaniya kurdên Iraqê û Îranê vet ê peyivîn. Sorani zimanê/lehceya piraniya (teqriben 2/3) ya kurdên Îranê û Iraqê ye. Koma sêyemîn anku kurdiya başûrî ji aliyê nêzîkî 2 milyon kurdan vet ê axiftin li beşên başûrî yên deverên kurdîaxiv yên Îranê û Iraqê û li gor deverên cuda navên cuda jî lê tên kirin wek feylî, kelhurî, kirmaşanî û hwd.

Edebiyata nivîskî ya kurdî di sedalan 15 de dest bi geşbûnê kir bi lehceya serekî kurmancî anku kurdiya bakurî. Yekemîn kitêba kurdî sala 1425 hatiye nivîsîn ji aliyê Elî Herîrî ve. Naskirîtirîn şairên wê serdemê Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran in. Navdartirîn berhema klasîk *Mem û Zîn* e ku berhemeke helbestî ya evîndarî, dilsojî û neteweperwerî û ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn û gelek caran wek dastana neteweyî ya kurdan tê qebûlkirin.

Heta sedsala 19 edebiyata kurdî ya nivîskî hema bêje bi temamî tenê helbest bûn û alimên kurd berhemên xwe yên zanistî, dîrokî û dînî bi erebî, farisî yan tirkî dinivîsîn.

Sedsala 19 herwiha dest bi bikaranîna lehceya din ya serekî anku sorani jî hat kirin bo nivîsîna edebiyatê, li destpêkê ew jî tenê di helbestan de.

Yekem rojnameya kurdî, ku piraniya wê bi kurmancî bû, sala 1898 derket. Nivîsîna pexşan û nesrê tenê di sedala 20 de bi kurdî dest bi geşbûnê kir.

²¹Nifûsa kurdan li xurbetê: https://en.wikipedia.org/wiki/Kurdish_population#Diaspora

²² Nivîsara Omniglotê li ser zimanê kurdî: <https://www.omniglot.com/writing/kurdish.htm>

²³ Lîsteya zimanên kurdî li gor Ethnologue: <https://www.ethnologue.com/language/kur>

²⁴ Nivîsara Omniglotê li ser zimanê kurdî: <https://www.omniglot.com/writing/kurdish.htm>

Her pênc romanên pêşîn yên kurdî ji aliyê Erebo Şemo (1897 – 1978) ve di navbera salên 1935 û 1969 de bi kurmancî li Yekîtiya Sovyetan hatin weşandin. Yekem romana bi soranî sala 1972 derket.

Kurdî bi kêmî bi sê alfabeyên cuda hatiye nivîsîn: erebî, latînî û krîlî. Heta destpêka sedsala 20 tenê alfabe ya erebî dihat bikaranîn. Salên 1920 û 1930 çendîn alfabe yê cuda yê latînî hatin pêşkêşkirin ku ji wan *Alfabe ya Hawarê*, ku yekem car li destpêka salên 1930 di kovara *Hawar* de hatiye bikaranîn, niha alfabe ya standard ya latînî ye bo nivîsîna kurdî. Li Tirkiyê, Sûriyê, Îranê û Ermenistanê û hinekî jî li Iraqê, ev alfabe bo nivîsîna kurmancî tê bikaranîn lê li Iraqê kurmancî bi piranî bi alfabe ya erebî tê nivîsîn.

Soranî teqriben bi temamî bi alfabe ya erebî tê nivîsîn tevî ku çend kitêb bi alfabe ya latînî jî hatine çapkirin. Alfabe ya latînî carinan herwiha di tekstên kurt tîn TV, namilke û hwd. de jî tê bikaranîn. Ew herwiha gelek di danûstandinên neformal yê wek email, medyaya civakî û hwd. de jî tê bikaranîn.

Kurdên Yekîtiya Sovyetan ya berê bo nivîsîna kurmancî alfabe ya krîlî bi kar dianî bi taybetî di navbera salên 1940 û salên 1990 de lê alfabe ya krîlî bo nivîsîna kurdî niha hema bêje bi temamî hatiye terkkirin. Gelek ji berhemên ku pêşî bi alfabe ya krîlî hatibûn nivîsîn û çapkirin, vê dawiyê ji nû ve bi alfabe ya latînî hatine çapkirin.

Tevî ku edebiyata nivîskî ya kurmancî çend sedsalan berî edebiyata nivîskî ya soranî dest pê kir jî, li nîveka duyem ya sedsala edebiyata soranî kariye ji ya kurmancî zêdetir pêşve biçê. Ev ji ber bisinorkirina berfireh, hema bêje qedexeya temam, ya li ser weşan û çapkirina bi kurdî li Tirkiyê bû, ku piraniya kurdên kurmancî axiv lê dijîn. Li aliyekî din, li Iraqê, ku zimanê piraniya kurdan li wê derê soranî ye, kurdan herdem otonomiyeke têra xwe bihêz ya kultûrî, eger ne herdem ya siyasî jî, hebûye.

Ji ber bisinorkirinên li ser zimanê kurdî li Tirkiyê bi taybetî pêştir, hema bêje hemû edebiyata kurmancî ya nivîskî ya di navbera salên 1920 û salên 1990 de li derveyî welat hatiye çapkirin. Tenê di salên 1990n de piçekê qedexeyên li ser edebiyata kurdî rabûne.²⁵

²⁵ Clémence Scalbert-Yücel: Emergence and equivocal autonomization of a Kurdish literary field in Turkey: https://www.academia.edu/26032561/Emergence_and_equivocal_autonomization_of_a_Kurdish_literary_field_in_Turkey

KURD Ê EDEBIYATA KURDÎ LI WELATÊN BAKURÎ

Koçberiya kurdan li Ewropayê salên 1960an û 1970yan dest pê kir gava ku gelek kurd bi taybetî ji Tirkîyê wek “karkerên mêvan” gihiştin rojava û bakurê Ewropayê. Tevî ku hinek ji wan vegeîn Tirkîyê

jî piştî çend meh yan salan, piraniya wan bi tamamî li wan welatan bi cih bûn û dûv re malbatên xwe jî anîn.

Piştî intilaba leşkerî ya sala 1980 li Tirkîyê û zindanîkirin gelek kurdan, di nav de nivîskar û çalakvan jî, hejmareke mezin ya kurdan daxwaza penaberîtiyê kir ji welatên Ewropayê, bi taybetî Swêdê. Dûv re dîsa hinek penaberên kurd, dîsa di nav de nivîskar û çalakvanên siyasî, ji Îran û Îraqê hatin, bi taybetî salên 1990. Niha jî gelek kurdên penaber ji şerê navxweyî yê Sûriyê direvin û wek penaber tî ku dîsa di nav de nivîskar jî hene.²⁶

Kurdan çendîn rêxistinên kultûrî li welatên Bakurî damezrandine ku hinek li ser kultûr û zimanê kurdî radiwestin, hinek zêdetir li ser integrekirina kurdan di civakên Bakurî de disekin û hinek jî giringiyê didin herduyan. Komeleyeke sîwanî ya rêxistinên kultûrî yên kurdî li Swêdê, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê²⁷, sala 1981 hat damezrandin. Komeleyeke hevşêwe, Federasyona Kurdên Fînlândayê (Kurdiliitto)²⁸ sala 2014 hat avakirin.

Yekem weşanxaneya kurdî li welatên Bakurî, *Roja Nû*, sala 1980 hat damezrandin. Wê piranî berhemên nivîskarên kurd yên li welatên Bakurî diweşandin. Weşanxaneyeke din, *Pencinar*²⁹, 1986 hat avakirin û wê giringî did aweşandina edebiyata devkî û veguhastina edebiyata kurdî ya kevnar ku bi alfabeya kurdî-erebî hatibû nivîsîn bo ser alfabeya kurdî-latînî û çapkirina wan berheman.

Weşanxaneyeke dîtir, *Apec*³⁰, sala 1988 hat damezrandin û wê bala xwe da ser weşandina kitêbên zarokan, bi taybetî yên ji swêdî li kurdî wergerandî. Weşanxaneyeke din jî, *Nûdem*, hem berhemên nûjen yên nivîskarên kurd û hem jî wergerandinên nivîskarên Bakurî û cîhanî diweşandin.

Kurdan dest bi yekem rojnameya xwe ya li welatên Bakurî kir sala 1979: rojnameyê mehane bi navê *Armanç* li Stockholmê. Wê zêdetir bala xwe dida doz kurdî li Kurdistanê, lê mehaneyê din, *Berbang*, ku 1981 dest bi weşana xwe kir bi piranî bi kurmancî û swêdî, giringiyê zêdetir dida mijarên têkilî kurdan li Swêdê û integrebûna kurdan di civaka swêdî de.

Piştî wan jî salên 1980an û 1990an çendîn kovarên mehane yan demsalane derketin ku zêdetir giringî didan edebiyatê. Bo nimûne *Çira*, *Dugir*, *Nûdem* û *Helwest* hemû kovarên demsalane yên edebiyata giştî bûn ku bo nimûne helbest, kurteçîrok, parçeroman, nirxandinên edebî, nasandina kitêban,

²⁶ Bo listeyê nivîskarên kurd li Swêdê, binêrin: <https://www.immi.se/kultur/authors/kurder/> (bi swêdî)

²⁷ Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê: <http://www.fkks.se/> (in kurdî û swêdî)

²⁸ Kurdiliitto anku Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Fînlândê: <http://kurdiliitto.fi/> (bi kurdî û fînlândî).

²⁹ Publishing house Pencinar: <http://www.pencinar.se> (bi kurdî).

³⁰ Weşanxaneya Apec: <http://apcepublishing.com/om-oss/> (bi swêdî û kurdî).

nivîsarên li ser dîroka edebiyatê, hevpeyivînên li gel nivîskaran û tiştên wisa diweşandin. Li rex van kovarên edebî yê giştî, çend kovarên taybet jî derketin: kovara perwerdeyê *Dengê Mamoste*, kovara tiyatro û sînemayê *Şano û Sînema*, kovara mîzahî *Mîrku* û kovara demsalane ya edebiyata wergerandî *Nûdem Werger*. Tevî ku hemû ev kovar li Swêdê derdiçûn, kurdên li welatên din jî yê Bakurî bi aktîvî di wan de dinivîsî.

Kitêbxaneyeyeke kurdî 1997 li Stockholmê hat avakirin bo parastina berhemên edebî yê kurdî û xizmetkirina xwandevanên kurd.³¹ Ji bilî komkirina kitêb û materyalên kurdî û yê li ser kurdan bi zimanên din, kitêbxane herwiha civîn û semînarên têkilî kultûra kurdî û herwiha integrebûna kurdan di civaka swêdî de saz dike.

Lê destpêka salên 2000an hemû kovarên edebî yê kurdî li welatên Bakurî êdî dest ji weşanê berdan. Piraniya wan bi temamî hatin girtin lê hinek jî êdî li ser internetê belav dibûn. Hinek kovarên edebî yê elektronîkî cihê wan girt ku hinek jê mehane, hinek jî wek din kê-m-zêde bi berdewamî belav dibûn. Yekem kovara edebî kurdî ya elektronîkî, *Mehname*, salên 1999 – 2006 dihat weşandin û ji Fînlandayê belav dibû lê bala gelek nivîskar û xwandevanên kurd dikêşa li seranserê dinyayê.

Çendîn malperên kurdî yê din jî yê kultûrî û edebî ji welatên Bakurî belav dibûn ku hinek piştî du-sê dehsalan hê jî çalak in lê hinek jî piştî çend salan êdî dest ji weşanê berda.

2. Rewşa niha û zehmetî

Meydana edebiyata kurdî li welatên Bakurî

Di vê beşê de ez ê hewl bidim wêneyekê li ser rewş û astengên li ber edebiyata kurdî li welatên Bakurî pêşkêş bikim. Yek ji astengên serekî ew e ku çawa nivîskarên kurd yê li welatên Bakurî dijîn dikarin debara xwe bikin hevdem ku bi temamî bala xwe bidin ser nivîsîna edebiyatê. Astengeke din jî peyda kirina budjeya çapkirina kitêban û xwegihandina xwandevanên xwe ye.

³¹ Kitêbxaneya Kurdî li Stockholmê: <http://kurdlib.org/> (bi kurdî û swêdî).

CÛREYÊN EDEBIYATÊ

Ji 46 kesên bersiva rapirsiyê dayî, 14 kesan got ku ew tenê edebiyatê dinivîsin, çar kesan got ku ew tenê edebiyatê werdigerînin û 28 kesên mayî jî got ku ew hem dinivîsin û hem jî werdigerînin. 3 bersivderan got ku ew herwiha edebiyata kurdî diweşînin û belav dikin.

Derbarê cûreyên edebiyatê, 8 kesan got ku ew herçi edebiyat e, ew tenê helbestan dinivîsin û 7 kesan jî got ku wan tenê roman weşandine. Lê wan jî herwiha kurteçîrok û/yan helbest nivîsîbûn. 5 kesan got ku tenê kurteçîrokên wan hatine weşandin. Dîsa 5 kesan got ku roman û kurteçîrokên wan hatine weşandin. Ji 3 kesan helbest û kurteçîrok û dîsa ji 3 kesan roman û helbest hatibûn weşandin. Bersivderekî nivîsî ku wî roman, kurteçîrok û helbestên wî jî hatine weşandin.

22 bersivderan got ku kitêbên wan (yan kitêbên wan wergerandî) bi piranî bo tenê bo xwandevanên mezin in. 7 kesan got ku ew kitêbên zarokan dinivîsin yan werdigerînin. Yê din got ku wan hem bo mezinan û hem jî bo zarokan kitêb nivîsîne yan wergerandine.

ZIMAN

Ji 46 kesên bersivdayî rapirsiyê, 32 kesan got ku wan edebiyat tenê bi kurdî nivîsiye. 14 kesan got ku wan edebiyat bi yek zêdetir zimanên din jî nivîsiye: 4an bi kurdî û erebî, 4an bi kurdî û tirkî, 2yan bi kurdî û farisî, 2yan bi kurdî, erebî û swêdî, 1ê bi kurdî, tirkî û swêdî û 1ê bi kurdî, erebî û norwecî. Yê ku got wan edebiyat tenê bi kurdî nivîsiye, duyan got ku wan hem bi kurmancî û hem jî bi soranî nivîsiye.

Tevî ku piraniyê bersiv da ku ew edebiyatê tenê bi kurdî dinivîsin, hemûyan got ku ew di jiyana xwe ya rojane de yek an çend zimanên din jî bi kar tînin. Teqriben hemû bersivder bi kêmî sêzimanî bûn anku bi van zimanan diaxivîn: 1) kurdî, 2) zimanê fermi yan serdest yê welatê jê hatî (erebî, ermenî, farisî yan tirkî) û 3) zimanê fermi yan serdest yê welatê niha lê dijî (danîmarkî, fînlandî, norwecî yan swêdî).

REWŞA JIYANÊ

Hemû nivîskar û/yan wergêrên bersivdayî rapirsiyê got ku ew niha bi awayekî aktîv edebiyata kurdî dinivîsin yan edebiyatê li kurdî werdigerînin. Ev tê wê maneyê ku edebiyata kurdî niha bi awayekî

aktîv li her çar welatên Bakurî yê nivîsîn ku hejmareke giring ya kurdan lê heye: Danîmarka, Fînlanda, Norwec û Swêd.

Lê ev nayê wê maneyê ku hemû nivîskarên kurd li welatên Bakurî di nivîsîna kurdî de aktîv mabin. Encama rapirsîyê dikare wisa jî were şirovekirin ku bi piranî tenê ji nivîskarên niha aktîv hatiye pirsîn. Yê jê hatî pirsîn jî, ihtimalen tenê nivîskarên aktîv bersiv daye û yê din na.

Heta nivîskarên aktîv jî bi piranî mijûlî warên derveyî edebiyatê bûn. Ji 34 kesên ku karê xwe yê serekî di rapirsîyê de diyar kir yan paşî di hevpeyivînê de, 12an got ku wek mamosta kar dikin (bi piranî wek mamostayên kurdî bo zarokan li xwandingehên bingehîn lê hinek jî wek mamostayên sinifan), 9 wek wergêr û tercimanên ne-edebî, 7 wek şirketdar, 2 wek siyasetvan û 1 wek parêzerê dadî. 2 bêkar bûn û bo xwe li derfetên nû digeriyan. Tenê 2 bersivderan got ku niha bi temamî mijûlî nivîsîn an wergerandina edebiyatê ne bi xêra borseyekê ku wan bo karê xwe yê edebî wergirtiye heta dawiya 2018.

Piraniya nivîskaran derfeta nivîsîn an wergerandina edebiyatê hebû tenê di dema xwe ya betal de. Hinekan karekî niv-demî yê ne-edebî bijartibû daku bikarin dema mayî bidin nivîsîn an wergerandina edebiyatê. Çend bersivderan got ku wan "“êkarî” bijartiyê daku bikarin bala xwe bidin nivîsîn an wergerandina edebiyatê.

Tinebûna derfetan bo nivîsîna tam-demî astengeke mezin e. Tinebûna demê li gel zehmetiyên peydakirina çapxaneyan dibe sebebê bêhêvîbûna gelek nivîskaran. Hinekan xwe spartiyê zimanê xwe yê duyem an heta zimanê sêyem b oweşandina berhemên xwe tevî ku ew piştrast in ku dikarin bi zimanê xwe yê dayikî kurdî baştir û xweştir binivîsin. Gelek bersivderan got ku wan têra xwe agahî yan zanîna zimanê fermi yê van welatan nîne û nikarin dawaya alîkariya aborî bo nivîsîn an çapkirina berhemên xwe bikin. Hinek bersivder dilsar bûbûn ku daxwaznameyên wan bêencam bûn. Hinekan salên 1980an û 1990an alîkarî wergirtibû lê dûv re na, tevî ku wan hemû agahî û bernameyên xwe pêşkêş kiribûn jî. Gişt yê ku berê alîkariya aborî bo edebiyatê wergirtibû, û yê di dema hevpeyivînê de jî xwedî borseyekê bûn, li ser wê qenaetê bûn ku wergirtina alîkariyê diwartir bûye.

Tecrûbeyên erênî yê daxwaznameyên qebûlkirî hema bêje bi temamî tenê ji Swêdê bûn, tenê du ji Norwecê. Li Danîmarkayê û Fînlandayê ji bersivderan alîkariya aborî wernegirtibû tevî ku dehdodeh daxwazname li herdu welatan hatibûn şandin dezgehên hikûmî û ne-hikûmî, hinek du yan sê daxwazname ji heman daxwazkerî lê bo weqfên cuda. Wergirtina alîkariya aborî ji welatên Bakurî bo nivîskarên kurd gelek giring e çunkî kêma kes ji wan dikarin ti alîkariyê ji dereke din wergirin.

Ji sala 2000 ve, hinek nivîskar û wergêrên kurd alîkariya aborî ji hikûmeta Herêma Kurdistana Iraqê û hinekan jî ji belediyên li Tirkîyê di destên kurdan de werdigirt. Lê alîkariya ji wan gelek biçûk bû û bi ti awayî têra jiyana bihagiran ya li welatên Bakurî nedikir eger mirov hevdem kar neke.

Herêma Kurdistana Iraqê ket ber qeyraneke aborî ya giran sala 2008. Alîkariya aborî bo çalakiyên edebî û kultûrî bi dijwarî daket xwarê. Ne tenê êdî alîkarî bo nivîskaran, bi taybetî yên li derveyî herêma otonom, nehat lê herwiha gelek weşanxane û kovarên kultûrî jî hatin rawestandin ku berê nivîskarên ji welatên Bakurî jî berhemên xwe tê de diweşandin yan bi rêya wan çap dikirin.

Li Tirkîyê hêdîka rewş ber bi başbûnê ve diçû bo edebiyata kurdî û çalakiyên edebî ji 2010 heta derbeya leşkerî ya biserneketî ya 2016. Ew ne ji aliyê kurdan ve hatibû kirin lê ji aliyê artêşa Tirkîyê ve ku ji berê ve dijmina kurdan û mafên wan yên kultûrî û siyasî bûye. Dîsa jî hikûmet bi dijwarî dijî hemû opozisyonê û hemû medya û çalakiyên kultûrî yên ne di bin emrê hikûmetê de bûn rabû. Gelek parlamenterên kurd hatin girtin û piraniya şaredarên herêma kurdî li rojhilatê Tirkîyê ji kar hatin avêtin. Tekane rojnameya rojane ya kurdî li Tirkîyê, *Azadiya Welat*, û herwiha du saziyên ziman û kultûra kurdî hatin girtin. Heman qeder bû para gelek kovar û rojnameyên kurdî yên hefteyane, mehane û demsalane û herwiha weşanxaneyên kurdî jî.

Çi edebiyat li welatên Bakurî li kurdî tê wergerandin?

Ji 46 kesên bersiva rapirsiyê dayî, 32 kesan got ku ew edebiyatê werdigerînin li zimanê kurdî. Lê tenê çar kesan ji wan got ku ew tenê wergêr in, 28 kesên din got ku ew hem edebiyatê dinivîsin û hem jî werdigerînin.

Li gor bersivên rapirsiyê û hevpeyvînên dîv re jî, wergerandina edebiyatê bo kurdî li welatên Bakurî bi piranî yan ji zimanên fermi yan serdest yên welatên kurdnişîn yên Rojhilata Navîn (erebî, tirkî, farisî û ermenî) yan ji zimanên fermi yên welatên Bakurî (swêdî, danîmarkî, norwecî yan fînlândî) tê kirin. Heta hinek klasîkên cîhanî jî ji swêdî (û li gel ji tirkî) li kurdî hatine wergerandin, bo nimûne *Don Quijote* ya Cervantes, *Merivên Reben* ya Dostoyevskî û *Mişk û Mirov* ya John Steinbeck.

Piraniya wergerên edebî ji zimanên Bakurî berhemên nivîskarên Bakurî ne. Piraniya wan ji nivîskarên swêdî yên klasîk û nûjen in ku ji swêdî hatine wergerandin; bi giranî berhemên zarokan ji Astrid Lindgren, lê herwiha edebiyata mezinan, pexşan be yan helbest, bo nimûne ji August Strindberg û

Karin Boye. Wergerên ji danîmarkî bi piranî tenê çîrokên Hans Christian Andersen in û wergerên ji norwecî jî du-sê şanoyên Henrik Ibsen in.

Ti berhemeke mezin ji fînlandî li kurdî nehatiye wergerandin û çapkirin. Wergerandina edebiyata fînlandî bi rêya zimanên din pêk hatiye bo nimûne ji *Heft Bira* ya Aleksis Kivi û *Sînuhê Misrî* ya Mika Waltari, herdu ji wergerên fransî. Lê antolojiyeke berfireh ya helbestên fînlandî – hem kevnares û hem nûjen – ji aliyê amadekarê vê raporê ve ji fînlandî li kurdî hatiye wergerandin lê hê nehatiye çapkirin.

Wergerandina edebiyata Bakurî li kurdî bi piranî li ser edebiyata zarokan sekiniye. Çar nivîskarên edebiyata zarokan di wergerandinê de serdest in: Hans Christian Andersen hem ji danîmarkî û hem bi rêya zimanên din û herwiha Astrid Lindgren, Sven Nordqvist, Ulf Löfgren û Gunilla Wolde ji swêdî.

Wek ku piraniya bersivderan jî got, wergerandina edebiyata Bakurî li kurdî tiştêkî bêbername ye, girêdayî wergêrên takekes e û carinan têkilî wergirtina alîkariya wergerandinê û/yan weşandinê. Ti bernameyeke diyar an planek ji aliyê kurdan yan welatên ew lê dijîn ve bo wergerandin û weşandina edebiyata Bakurî li ser bingehê giringiya berhemên edebî û/yan pêwîstiya xwandevanên kurd nehatiye danîn.

Weşandina edebiyata kurdî

Kitêbên pêşîn yê bersivderên rapirsîyê li salên 1980 û 1981 hatine weşandin û paşîn kitêb jî salên 2017 û 2018. Piraniya kitêbên bersivderan di navbera salên 2009 û 2012 de derketine.

Ji bersivderan 3 kes an jî 10 kitêban zêdetir nivîsîne û/yan wergerandine, 8 bersivderan zêdetir jî 5 kitêban û 7 bersivderan tenê kitêbek.

Hejmara kitêbên çapkirî yê bersivderan wiha ye:

Cûre	Hejmara kitêbên cuda
Romanên nivîsandî	73
Kitêbên kurteçîrokên nivîsandî	16
Kitêbên helbestên nivîsandî	24
Kitêbên zarokan yê nivîsandî	8
Berhemên nivîsandî li ser dîroka edebiyatê yan rexneyên edebî	5

Romanên wergerandî	67
Kitêbên kurteçîrokên wergerandî	18
Kitêbên helbestên wergerandî	7
Kitêbên zarokan yên wergerandî	23
Berhemên wergerandî li ser dîroka edebiyatê yan rexneyên edebî	2
Hemû	243

Ji van hemû kitêban, 108 li Swêdê hatibûn weşandin, 63 li Tirkîyê, 47 li Iraqê (Kurdîstana Iraqê), 14 li Norwecê, 8 li Danîmarkayê û 3 li Fînlandayê. Swêd welatê serdest – hema bêje tekane – yê weşandinê bû salên 1980an û 1990an yê berhemên nivîskar û wergêrên bersivdayî. Lê salên 2000an Swêd daketiye piştî Tirkîyê û Iraqê.

Ji destpêkan 1980an ve deh-dozyeh weşanxaneyên kurdî (wek Roja Nû û Nûdem) li welatên Bakurî hebûn ku li yan li derdorî Stockholmê bûn. Lê teqriben niv ji weşanxaneyan kêmtirî 50 kitêbên cuda weşandin. Hinek weşanxaneyan giraniya xwe dabû ser çapkirina berhemên tenê çend nivîskaran, carinan tenê kitêbên xwediyê/a xwe. Niha tenê weşanxaneyekê aktîv li welatên Bakurî maye, Weşanxaneya Apec (Apec Förlag) li Swêdê.³²

Weşandina berhemên xwe-bi-xwe di nav nivîskarên kurd de gelek berbelav e û heta di nav wergêran de jî. Ji 37 kesên hevpeyivîn li gel kirî, 14 kesan got ku wan bi xwe yekem kitêba xwe çap kiriye û 6 kesan got ku wan bi xwe hemû kitêbên xwe çap kirine.

Tevî ku hemû bersivderan yek an zêdetir kitêbên xwe dane weşandin jî, di rastiyê de hemûyan gazin kirin ku zehmet e mirov weşanxaneyekê bo kitêbên xwe bibîne. Hemû bersivderan ji bilî sê kesan got ku wan yek an zêdetir kitêbên hazir bo çapkirinê hene lê çapxane nînin kitêbên wan biweşînin. ÇAr bersivderan got ku wan pênc an zêdetir kitêbên li ber weşandinê hene lê ev zêdeyî pênc salan e ku wan ti weşanxane peyda nekiriye.

Hinek helbestvan û çîroknivîsan berhemên xwe li ser internetê belav kiribûn. Hinekan got wan wisa kiriye çunkî wiha hêsantir e mirov xwe bigihîne xwandebaran. Hinekên din xwe spartibû vî awayê belavkirinê piştî ku ti weşanxane bo berhemên xwe nedîtibûn. Hinek bersivderan nedixwast wisa

³² Malpera Weşanxaneya Apecê: <http://apecpublishing.com/>

bikin çunkî wan hêvî dikir ku bikarin bo xwe weşanxaneyekê bibînin û ditirsiyan ku eger berhemên wan li ser internetê hebin, êdî ti weşanxane wan belav nake.

Romannivîsan teqrîben hemûyan nedixwast berhemên xwe li ser internetê belav bikin çunkî bi nêrîna wan roman bo xwandinê li ser internetê zêde dirêj in. Ev qenaeta nifşê pîrtir bû. Li aliyekî din, hinek bersivderên ciwantir li ser wê baweriyê bûn ku divê hemû tiştên bi kurdî nivîsandî li ser internetê belav bibin. Wan balk îşande ser wê yekê ku xwandevevanên edebiyata kurdî li seranserê dinyayê berbelav in û zehmet û giran e ku nivîskar û xwandevevan bêyî internetê xwe bigihînin hev.

Xwegihandin xwandevevanan

Piraniya xwandevevanên edebiyata kurdî helbet li Kurdistanê ne, dûr ji nivîskarên kurd yê ku li welatên Bakurî dijîn. Xwegihandina xwandevevanên edebiyata kurdî berî çend dehsalan karekî gelek zehmet bû. Ne tenê ji ber bihayên giran yê şandina kitêban ji welatên Bakurî bo parçeyên cuda yê Kurdistanê lê herwiha ji ber qedexeya li ser kitêbên kurdî li Îran, Sûriye û Tirkiyê û herwiha embargoya bazirganî ya li ser şandin û wergirtina kelûpelan, kitêb jî di nav de, bo Iraqê.

Tevî ku qedexeyên siyasî û aborî hinekî rabûne jî – û hinekî mane, bi taybetî li Îranê – gelek asteng hê jî hene.

Piraniya kitêbên kurdî yê li welatên Bakurî ji aliyê weşanxaneyên biçûk bi îmkânên bisinor û bêtî ti derfet yan planên reklamkirinê hatine weşandin. Gelek nivîskar neçar in ku bi xwe kitêbên xwe biweşînin bêyî ti budjeyê terxankirî bo gihandina bazarê û marketingê. Ji ber derfetên bisinor gelek nivîskar û weşanxane hejmareke biçûk ji her kitêbekê diweşînin, adeten 100 ta 1000 liban. Loma piraniya berhemên weşandî piştî demeke kurt êdî bo bikiran ne bedrest in.

Bi dehan weşanxaneyên biçûk kitêbên kurdî li welatên Bakurî weşandine di navbera salên 1980an û destpêka 2010an de, hinekan çend sed kitêb (bo nimûne weşanxaneyên Nûdem û Pencinar), hinan

bi dehan (bo nimûne weşanxaneyê Helwest û Weşanên Welat), hinekan jî tenê çend kitêb (bo nimûne weşanxaneyê Xanî & Bateyî li Kopenhagê). Lê niha ti ji van weşanxaneyan naxebitin. Ev ne tenê tê wê maneyê ku ew êdî kitêbên nû naweşînin, lê herwiha kitêbên wan yê kevî jî bo kirîna li ti derê peyda nabin.

Gelek nivîskar hewceyî jinûveweşandina kibêbên xwe ne daku wan berdest bikin piştî ku weşanxaneyên wan yê berê ji kar ketine. Hinek berhemên salên 1980an û 1990an li welatên Bakurî çapkirî dîsa hatine weşandin salên 2000an li Tirkiye û Iraqê. Lê hemû nivîskaran ev "luks" nîne dîsa kitêbên xwe bidin çapkirin çunkî heta weşandina berhemên nû jî gelek bi asteng e û alîkariya wan nayê kirin bo çapkirinê, îcar alîkariya nivîskariyê li rexekî din.

Gelek bersivderên vê rapirsîyê gilî û gazinan dikin ku weşandin an reklamkirina berhemên edebî yê kurdî ne herdem li gor kalîteya wan ya edebî ye. Wan got ku weşandin zêdetir girêdayî şiyana nivîskaran ya xwegihandina weşanxaneyan, dezgehên kultûrî û – bi taybetî li deverên kurdînişîn yê Rojhilata Navîn – hevbendîya li gel biryarderên siyasî ye.

Gelekan gazin kir berhemên nivîskarên baş-naskirî sal bi sal tî weşandin û reklamkirin tevî ku ew ti berhemên nû na-afirînin jî, lê nivîskarên nû bi piranî tî paşguhkirin.

Jikarketina weşanxaneyên kevî yê kurdî û serhildana hinekên nû li welatên Bakurî wek tiştêkî jênegar hat dîtin ji aliyê bersivderan ve. Sebebên vê ew e ku piraniya weşanxaneyan ji aliyê tenê kesekî dilxwaz ve tê birêvebirin, ku bi piranî amator in bêyî şarezatiyeke pêştir di wî warî de, îcar xwandekariya di wî warî de bi temamî li aliyekî.

Bi qenaeta bersivderan kitêbxane gelek giring in bo parastin û hilgirtina kitêbên kurdî yê weşandî û berdestkirina wan bo xwandevanan tevî geremola meydana weşangeriya kurdî jî. Kitêbxaneyê Kurdî ya Stockholmê (Kurdiska biblioteket)³³ wek rolgêra serekî di parastina kitêbên kurdî de hat behskirin ku gelek ji wan kitêban êdî li ti dereke din ya dinyayê peyda nabin. Du bersivderan got ku Kitêbxaneyê Kurdî ya Stockholmê "Kitêbxaneyê Neteweyî ya Kurdî" ye bêyî ti hevta heta li Kurdistanê jî.

Kitêbxaneyê Kurdî ya Stockholmê li gor sîstema kitêbxaneyên Swêdê dixebite. Ew kitêban bi emanet dide xwandevanên seranserî Swêdê. Bersivderên rûniştvanên welatên din yê Bakurî giliya wê yekê kirk u nikarin ji vê kitêbxaneyê pirtûkan deyn bikin. Serokê kitêbxaneyê bixêrhatin li wê fikrê kirk u

³³ Kitêbxaneyê Kurdî li Stockholmê: <http://kurdlib.org/>

meydana çalakiyên kitêbxaneyê berfireh bibe û hêviya hevkarîya li gel kitêbxaneyên neteweyî yê welatên Bakurî kir bo mimkinkirina hindê, bo nimûne din bin serperîştîya Encumena Wezîran ya Bakurî (Nordic Council of Ministries, Nordiska Ministerrådet) de.

Têkilî li gel welatên jê hatî

Hemû nivîskarên ku bersiva rapirsîyê da û/yan hevpeyvîn pê re hat kirin li Kurdistanê yan li deverên din yê kurdnişîn hatibûn dinyayê. Wan hemûyan heta dereceyekê têkiliyên xwe li gel welat yan devera jê hatî parastîye, hinekan heta têkilî li gel deverên din jî yê kurdnişîn heye, bi taybetî li gel Herêma Kurdistana Iraqê.

Hinek bi berdeyamî serdana deverên kurdî dikin û carinan kitêbên xwe li wan deran diweşînin û heta bi xwe jî belav dikin. Hinek nikarin serdana welatê jê hatî bikin ji ber tîrsa çewisandinê ji aliyê hikûmetê ve (bi taybetî li Îran û Tirkiyê) yan ji ber rewşa ne-ewle ya deverê (bi taybetî li Iraq û Sûriyê ku şer heye).

Di hemû sedsalan 20an de weşandin û çapkirina bi zimanê kurdî yan bi giranî hatibû bisinorkirin (li Îran û Sûriyê) yan bi temamî qedexa bû (li Tirkiyê)³⁴. Tenê li Iraqê rêjeyeke azadiyê bo ziman û edebiyata kurdî hebû lê li aliyekî din, rewşa asayîşê li herêma kurdnişîn ya Kurdistana Iraqê heta ji van welatên din jî xirabtir bû ji ber helwesta dijwar ya hikûmeta Iraqê dijî daxwaza kurdan bo otonomiyeke berfirehtir.

³⁴ New York Times: Amid Turkey's Purge, a Renewed Attack on Kurdish: <https://www.nytimes.com/2017/06/29/world/middleeast/amid-turkeys-purge-a-renewed-attack-on-kurdish-culture.html>

Nivîskarên kurd yên li hinder û derveyî Kurdistanê berê bi piranî neçar bûn kitêbên xwe li derveyî welat bidin çapkirin. Piştî yekem pêlên karkerên kurd ji Tirkîyê bo bazara Ewropayê li salên 1970an û 1980an û hatina penaberên kurd ji Iraqê bo Ewropayê salên 1980an û 1990an bi sedan kitêbên kurdî li welatên cuda yên Ewropayê, bi taybetî li Swêdê û Almaniyayê hatin çapkirin. Salên 1990an hejmareke rojname û kovarên kurdî li Ewropayê çap dibûn, piraniya wan li Swêdê. Tevî ku hinek ji wan nûçeyên rojane û siyasî diweşandin jî, piraniya wan giraniya xwe dida ser kultûr û edebiyatê.

Lê nivîskarên kurd nedikarî xwe bigihînin piraniya xwandevevanan ku li Kurdistanê bûn. Yan belavkirina kitêban li wan deverên kurdî qedexe bû (li Îran, Sûriye û Tirkîyê) yan gelek zehmet bû (li Iraqê ji ber embargoya aborî ya zilhêzên Rojava li ser hikûmeta Iraqê danabû.)

Li destpêka salên 2000an, gelek kurdên li xurbetê dijiyan karîna kitêbên xwe li Kurdistana Iraqê bidin çapkirin ji ber rewşa başbûyî ya aborî li wê deverê. Lê bi pêla qeyrana aborî ya cîhanî ya 2008 re û ji ber korerêya siyasî ya li gel hikûmeta navendî ya Iraqê, ziyaneke giran bi aboriya herêmê ket³⁵, ku tesîreke dijwar ya xirab li çalakiyên kultûrî û edebî jî kir.

Welatekî din ku edebiyata kurdî lê geştir bû li destpêka salên 2000an Tirkîye bû: hem li devera kurdnişîn û hem jî li bajarên mezin yên Tirkîyê, bi taybetî li Stembolê. Lê, piştî dîsa destpêkirina şer di navbera artêşa Tirkîyê û serhildêrên kurd de li 2015 û piştî derbeya leşkerî ya têkçûyî li 2016, hikûmeta Tirkîyê bêtehemiliya xwe ya sedsalî dijî zimanê kurdî dubare kir³⁶ û tenê rê dide propagandaya neteweperist ya tirkî û îslamî bi rêya kanala xwe ya kurdî “TRT Kurdî”.

³⁵ United States Institute of Peace: Kurdistan Region’s Debt Crisis Threatens Iraq’s Economy: <https://www.usip.org/publications/2018/05/kurdistan-regions-debt-crisis-threatens-iraqs-economy>

³⁶ New York Times: Amid Turkey’s Purge, a Renewed Attack on Kurdish: <https://www.nytimes.com/2017/06/29/world/middleeast/amid-turkeys-purge-a-renewed-attack-on-kurdish-culture.html>

Danûstandin û hevkarî li gel nivîskarên din

Li Kurdistanê kurd û nivîskarên kurdî di navbera çendîn welatan de hatine parvekirin ku hikûmetên wan welatan ji berê ve xwestiye ku hatinûçûn û danûstandina di navbera wan de zehmet be bi taybetî gava ku mesele çalakiyên kultûrî û edebî bin.

Li welatên Bakurî nivîskarên kurdî li çar an pênc welatan belav bûne, hinek li beşên jêrîn yên Danîmarkayê, hinek li jortirîn beşên Fînlândayê, Norwecê û Swêdê dijîn. Lê piraniya wan li derdorên paytextên welatên Bakurî civiyane: li Kopenhagê, Helsinki, Oslo û bi taybetî Stockholmê. Yên li derveyî paytextan dijîn jî, bi piranî li hinek bajarên din yên mezin bi cih bûne, bo nimûne li Aarhusa Danîmarkayê, Bergena Norwecê, Göteborga Swêdê û Turkuya Fînlândayê.

Nivîskarên kurd yên li Stockholmê dijîn behsa wê yekê kir di hevpeyvîn û/yan rapirsiyê de ku ew gelek caran rû-bi-rû nivîskarên din yên kurd dibînin. Wan çendîn civîn û kombûn hene her sale, bo nimûne, civînên komeleya nivîskarên kurd li Swêdê³⁷, seminar û nasandinên kitêban, bi taybetî li Kitêbxaneyê Kurdî ya Stockholmê, yan hevdîtinên kêmtir fermî li kitêbxaneyan, qehwexaneyan û xwaringehan û herwiha li malên hev.

³⁷ <http://niviskar.se/>

Nivîskarên kurd li welatên din yê Bakurî gelek kêmtir derfetên hevdîtinên rû-bi-rû hene. Li ber herêma Stockholmê, hejmara nivîskarên kurd li deverên din gelek kêmtir e. Ti cihekî diyarkirî bo çalakiyên edebî yê kurdî jî li paytextên din yê Bakurî nînin.

Di hevpeyvînên bo vê raporê de gelek nivîskaran got ku ew bîriya hevdîtinên rû-bi-rû, danûstandinan û veguhastina fikrên hev dikin. Hinekan got ku bi xêra teknolojiya nû niha hêsantir e ew bi rêya vîdyofonan, emailan û komên medyaya civakî danûstandinan bikin. Wan rewş da ber salên 1980an û destpêka salên 1990an ku têkilî tenê bi rêya posteya hêdî û telefonkirinê mimkin bû û nivîskar hingê ditirsiyan têkiliyê li gel nivîskarên li Kurdistanê dijiyan bikin ji ber ku bifikar bûn ku bo wan pirsgirêk çêbin ji aliyê hikûmetan ve.

Gelek bersivderan gazin ji hindê dikirin ku danûstandina di navbera wan û nivîskarên zimanên fermî serdest li van welatan anku li gel nivîskarên danîmarkî, fînlandî, norwecî yan swêdî gelek kême yan qet nîne. Gelek kême ji wan bûbûn hevalên nivîskarên zimanên Bakurî tevî ku wan hinek hevalên din yê Bakurî hene jî. Bo kesên ku bûne nivîskarên nivîskarên Bakurî yê “xwemalî”, tecrûbeyên baş peyda bûne. Hinek ji wan li gel hevalên xwe hevkarîya nivîskariyê jî kiriye, bo nimûne bi wergerandina berhemên hev.

Bersivderan hêvî kirk u danûstandin û veguhastina fikran di navbera nivîskarên zimanên piraniyan û nivîskarên zimanên kêmaniyan de zêdetir bibe. Hinekan hêvî kir ku nivîskarên zimanên kêmanî jî bikarin bibin endamên yekîtiyên nivîskaran li welatên lê dijîn. Li hemû welatên Bakurî ev ne mimkin e. Bo nimûne, li herdu yekîtiyên nivîskaran yê Fînlandayê – Yekîtiya Nivîskarên Fînlandî û Komeleya Nivîskarên Swêdî li Fînlandayê – şert e bi kêmî du kitêbên nivîskarî bi fînlandî yan swêdî hatibin weşandin heta ku bikare bibe endam.

3. PÊŞNIYAZ

Di rapirsî û hevpeyvînên bo vê raporê de, ji nivîskar û wergerên kurd ne tenê pirsar rewşa niha lê herwiha pêşniyazên wan bo derbarê baştirkirina rewşa nivîskarî û wergêriyê jî hat kirin.

Pêşniyazên jêrîn li ser bingehê daxwazên bersivderên hevpeyvînê û/yan rapirsîyê ne. Hemû pêşniyazên rêzkirî ji aliyê bi kêmî sê kesên bersivdayî ve hatine pêşkêşkirin.

- 1. Pêşxistina xwandinê.** Bila kitêbxaneyên giştî yê welatên Bakurî û xwandingehên ku xwandekarên kurd hene kitêbên kurdî (kitêbên dengî jî) bo zarok û mezinan bikirin. Hevdîtînan xwandina edebiyatê bila bîrêkxistin li gel nivîskar û wergêrên kurd û koçberên din ku ew bikarin kitêbên xwe bo mêvanên kitêbxaneyan û xwandekarên xwandingehan bixwînin. Yek ji xalên girîngdanê bila li ser edebiyata bi zimanê hêsan nivîsî be daku alîkariya kesên bi pirsgerêkên xwandinê jî bike.
- 2. Alîkarî bo nivîsîn û weşandinê.** Pêwîstiya edebiyata kurdî li welatên Bakurî bi alîkariyê zêdetir heye b oweşandin û çapkirina berheman. Pêwîstiya nivîskaran bi alîkariyê heye bo

çawaniya dagirtina daxwaznameyan, û divê haya nixînerên daxwaznameyan jî ji rewşa edebiyata kurdî hebe. Hemû berhemên edebî ne di forma kitêbên çapkirî de ne; şiklên din jî yên bikêhatî bo nimûne malper, blog, vlog û kom an platformên medyaya civakî ne ku edebiyatê bertînin yan belav dikin.

- 3. Beranîna materyalên dijîtal bo xwandekekarên kurdîziman.** Mamosta û xwandekevanên kurd li welatên Bakurî gelek hewceyî materyalên dijîtal in bo bikaranîna hînkirina kurdî li xwandingehan, lîseyan û zanîngehan. Beranîna materyalên wiha dikare bi rêya projeyê hevpar ya welatên Bakurî be yan ji aliyê desteya perwerdeyê ya welatekî ve were birêvebirin, bo nimûne wek di beranîna materyalên dijîtal yên xwandingehan bi zimanê somalî ji aliyê Desteya Perwerdeyê ya Fînlândayê ve (Opetushallitus, Utbildningsstyrelsen).³⁸
- 4. Pêşkêşkirina nivîskariya afirîner bo nivîskaran (nivîskarên ayindeyê).** Bila kursên nivîskariya afirîner bînin sazînin, bi taybetî bo ciwanan lê herwiha bo mezinan jî. Gelek kurd, piştî bicihhiştina welat, mal, malbat û hevalên xwe û tûşîbûna jiyana li xerîbiyê, dê bikarin feyde bibînin ji derbirina serpêhatî û derdeseriyên xwe bi rêya edebiyatê. Kursên nivîskariya afirîner dikarin bi kurdî bin ji aliyê nivîskarên kurd ve yan jî ji aliyê şarezayên welatê bicihbûnê bin, eger mimkin be bi rêya tercimanan. Bila beşdar bînin handan ku bi zimanê xwe yan jî bi zimanê serekî yê welatê bicihbûna xwe yan jî bi herduyan binivîsin.
- 5. Deynkirina kitêbên ji welatên din yên Bakurî bo hemû rûniştvanên welatên Bakurî bila hêsantir bibe.** Kitêbxaneyên Kurdî ya Stockholmê yek ji kitêbxaneyên kurdî yên herî mezin e li hemû dinyayê. Wê zêdeyî 14 000 kitêbên cuda bi kurdî nivîsandî yan bi zimanekî din li ser kurdan hene, herwiha berhevokeke bi dehan kovar û rojnameyan jî. Kitêbxaneyên li gor sîstema giştî ya kitêbxaneyên Swêdê dixebite. Lê deynkirina materyalê ji kitêbxaneyê tenê bo rûniştvanên Swêdê mimkin e. Ev yek dike ku kurdên welatên din yan kesên ku ziman, kultûr yan civaka kurdî dixwînin an lê dikolin nikarin sêdê ji wan berhevan wergirin. Bila sîstemek were avakirin ku bi rêya kitêbxaneyên neteweyî yan pîrziymanî li welatên Bakurî mirov bikare kitêban ji Kitêbxaneyên Kurdî deyn bike. Kitêbxane alîkariya aborî ji belediya Stockholmê werdigire lê alîkariya tê wergirtin têra wê nake û gelek pêwîstiya wê bi alîkariyê zêdetir

³⁸ Ko barbaar afka hoyo: <http://www11.edu.fi/somali4/> (bi somalî).

heye daku bikare xizmeta cemawerê xwe bike. Alîkariyeke hevbeş ya welatên Bakurî bo wê dê bikêrhatî be.

6. Amadekirina planeke wergerandina edebiyatê di navbera kurdî û zimanên Bakurî de.

Niha wergerandina edebiyata Bakurî li zimanê kurdî bi piranî bêyî ti bernameyeke giştî û bêalî tê kirin. Bila bernameyek yan projeyek bê amadekirin ka çî berhemên edebî giring e ku ji zimanên fermî yan serdest yên Bakurî (danîmarkî, fînlandî, norwecî û swêdî) li kurdî bîn wergerandin û çî berhemên kurdî jî li zimanên Bakurî. Yan jî, li her welatekî Bakurî bila bernameyeke cud abo wergerandina edebiyatê ji û li kurdî were amadekirin. Bernameya wergerandina dikare herwiha planeke berfirehtir ya wergerandina zimanên resmî li zimanên koçberan be. Bila di bernameyê de hem berhemên klasîk û hem jî yên nûjen hebin. Bila hindê ji wergeran bo mezinan, hin bo ciwanan û hindê jî bo xwandevanên zarok bin yan bo dêbaban ku bo wan bixwînin. Bila bernameya wergerandinê ne tenê li ser wergerandina ji zimanên Bakurî li kurdî be lê herwiha ji kurdî jî li zimanên Bakurî be.

7. Afirandina meydanake vîrtual bo nivîskarên koçber. Bila meydanake vîrtual bo nivîskarên koçber li her welatekî Bakurî bêt avakirin û birêvebirin. Bila di malpereke wiha de hem beşek bo nivîsîna bi zimanên koçberan û hem jî beşek bo nasandina nivîskarên koçber hebe û parçeberhemên wan li zimanên serekî yên Bakurî û/yan li inglîzî bîn wergerandin.

8. Derfeta endambûnê di yekîtiyên nivîskaran de. Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê bila bêt berfirehkirin û bibe yekîtiya nivîskar û wergêrên edebiyatê yên kurd li hemû welatên Bakurî. Bila derfeta endambûna di yekîtiyên nivîskaran yên welatên Bakurî de li nivîskarên kêmanî û koçberan jî vebe, di nav wan de nivîskar û wergêrên kurd jî. Çalakiyên pevnasandina nivîskarên zimanên serdest û kêmanî/koçberan bila bîn sazkin û/yan pêşxistin.

Bîbliyografya

Alakom, Rohat: *Kurderna fyrtio år i Sverige* (Çil salên kurdan li Swêdê). Stockholm 2007.

Country Report on multilingual issues: Norway:

<http://www.mek.oszk.hu/minerva/html/dok/norway.pdf>

Ethnologue: Kurdish languages: <https://www.ethnologue.com/language/kur>

Hassanpour, Amir: *Nationalism and Language in Kurdistan 1918- 1985*. San Francisco 1992.

Kingsley, Patrick: *Amid Turkey's Purge, a Renewed Attack on Kurdish*. New York Times July 29, 2017:

<https://www.nytimes.com/2017/06/29/world/middleeast/amid-turkeys-purge-a-renewed-attack-on-kurdish-culture.html>

Kurdere i Denmark (Kurdên li Danîmarkayê) <https://jyllands-posten.dk/indland/ECE5105449/Fakta-Kurdere-i-Danmark/> <https://www.information.dk/kultur/2007/08/danmarks-stoerste-sprog> yan <https://jiyan.dk/2011/10/hvor-mange-kurdere-bor-der-i-danmark/> (hemû bi danîmarkî).

Kurder i Sverige (Kurds in Sweden): https://sv.wikipedia.org/wiki/Kurder_i_Sverige (bi swêdî).

Immigrant-institutet (Instîtuya Koçberiyê): Lîsteyeke nivîskarên kurd li Swêdê:
<https://www.immi.se/kultur/authors/kurder/> (bi swêdî)

Omniglot: Kurdish languages: <https://www.omniglot.com/writing/kurdish.htm>

Polat, Lokman: Li Swêdê Kovargerîya Kurdî: <http://www.kulturname.com/?p=5017>.

Rûdaw: Sweden; home of the Kurdish books in exile:
<http://www.rudaw.net/english/culture/080620161>

Scalbert-Yücel, Clémence: Emergence and equivocal autonomization of a Kurdish literary field in Turkey:
https://www.academia.edu/26032561/Emergence_and_equivocal_autonomization_of_a_Kurdish_literary_field_in_Turkey

Skutnabb-Kangas, Tove & Phillipson, Robert (1993): Linguistic Rights for the Kurds.
https://www.academia.edu/32244233/LINGUISTIC_HUMAN_RIGHTS_FOR_THE_KURDS

Språken i Sverige (Zimanên li Swêdê) <https://www.sprakochfolkminnen.se/om-oss/for-dig-i-skolan/sprak-for-dig-i-skolan/spraken-i-sverige.html> (bi swêdî). Binêre herwiha *Språktidningen* 2/2018 li <http://spraktidningen.se> (herwiha bi swêdî).

Suurimmat vieraskielisten määrät (Komên mezîna yêna zîman-bîyanî):
http://vertinet2.stat.fi/verti/graph/Graphserver.htm?ifile=quicktables/Maahanmuuttajat/kieli_2&lang=3&x=540&gsk=2 (bi fînlandî).

Tayfun, Mehmet: *Kurdiskt författarskap och kurdisk bokutgivning. Bakgrund, villkor, betydelse*. (Nivîskarî û weşangerîya kurdî. Paşxan, şert û giringî). Stockholm 1998.

UNPO report: Iranian Kurdistan: Restriction On Use of Minority Languages:
<http://www.unpo.org/article/15402>

Uzun, Mehmed: *Destpêka edebiyata kurdî*. Stockholm 1992.

Wikipedia: Kurdish population in diaspora: https://en.wikipedia.org/wiki/Kurdish_population

The World Fact Book, <https://www.cia.gov/library/publications/the-world-factbook/index.html>

DEZGEHÊN KURDÎ YÊN KULTÛRÎ LI WELATÊN BAKURÎ

Amîda Kurd (malpereke nûçeyan li Swêdê): <http://amidakurd.net/>

Weşanxaneya Apec: <http://apecpublishing.com/> (bi kurdî û swêdî)

Dibistana Kurdî (malperek materyalên hînkirinê li Swêdê): <http://dibistanakurdi.com/>

Fêrgey Zimanî Kurdî Yagey Ziman (malperek bo hînbûna zimanê kurdî li Swêdê):

<http://diyako.yageyziman.com/>

Federasyona Kurdên Fînlândayê: <http://kurdiliitto.fi/>

FKKS (Federasyona Komeleyên Kurdistanî li Swêdê): <http://www.fkks.se/>

Hindik Rindik (blogeke çalak li ser mijarên edebî û kultûrî li Swêdê ji sala 2007 ve):

<http://zinarexamo.blogspot.com/>

Jiyan (malpereke kultûrî bi kurdî û danîmarkî li Danîmarkayê): www.jiyan.dk

Kanîzar (kovareke zimanê kurdî û zimannasiyê li Fînlandayê):

<https://zimannas.wordpress.com/2016/05/17/hemu-hejmaren-kanizare/>

Kulturname (malpereke kultûrî ya kurdî li Swêdê): www.kulturname.com

Lîsteyeke nivîskarên kurd li Swêdê: <https://www.immi.se/kultur/authors/kurder/> (bi swêdî)

Bloga Murad Ciwan (blognivîsekî çalak li ser mijarên edebî û dîrokî li Swêdê):

<https://muradciwan.com/>

Nefel (malpereke kultûrî û kitêbxaneyeye dijîtal ya kitêbên kurdî li Swêdê): www.nefel.com

Pencinar (weşxaneyeye kurdî li Swêdê): <http://www.pencinar.se>

Radyoya Swêdê bi kurdî: <https://sverigesradio.se/radioswedenkurdishradyoyaswede>

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê: www.niviskar.se

Kitêbxaneya Kurdî li Stockholmê: <http://kurdlib.org/>

Xweza (weşxaneyeye kurdî li Danîmarkayê): <http://xweza.com/>

Zimannas (blogeke li ser zimanê kurdî û zimannasiyê ji Fînlandayê):

<https://zimannas.wordpress.com/>

HUSEIN MUHAMMED

Husein Muhammed (1980 li Kurdistana Iraqê hatiye dinyayê) parêzer, nivîskar û wergêrekî kurd e ku ji sala 1994 ve li Fînlandayê dijî. Ew pêştir wek parêzer bo penaxwazan li Navenda Şêwirmendiya Penaberan ya Fînlandayê û wek şarezayekî li Nûneratiya Kêmaniyan û herwiha li Navenda Pêşxistina Aborî (ELY-keskus) û li bajarvaniya Helsinki xebitiye. niha ew li dezgeheke taybetî ya perwerde û hînkirina mezinan dixebite.

Husein Muhammed ji sala 1995 ve, ku hingê 15 salî bû, mijûlî nivîsîn û wergerandina edebiyata kurdî ye. Sê kitêbên wî bi xwe û 15 kitêbên wî wergerandî li Stockholmê û Stembolê hatine weşandin. Wî herwiha kitêbek bi fînlandî jî nivîsiye û daye weşandin bi navê *Yhtä erilaiset* ("Wekhev Cuda", Helsinki 2011) derbarê misilmanan di civaka fînlandî de û herwiha hejmareke mezin ya nivîsaran di kitêbên din de û gelek nivîsar jî di medyaya fînlandî de.

Ji bilî edebiyatê, ev demeke dirêj e ku ew mijûlî çendîn projeyên zimannasî û ferhengszazî ye jî. Ji bilî karê xwe yê rojane, ew bi hevkarî ferhengeke fînlandî-kurdî bo Instîtuya Zimanên Fînlandayê (Kotus) dinivîse.³⁹

RAPIRSÎ (Kurmancî)

RAPIRSÎ BO NIVÎSKAR, WERGÊR, WEŞANGER, KITÊBXANE, DEZGEHÊN KULTÛRÎ Û HWD. YÊN KURDÎ LI WELATÊN SKANDINAVYAYÊ

PÊŞGOTIN

Silav,

Ez Husein Muhammed im û niha lêkolînekê li ser edebiyata kurdî li welatên Skandinyayê dikim. Lêkolîn ji aliyê dezgeha *Kultûr bo Hemûyan* ve hatiye xwestin ku rêxistineke çandî ye û ji aliyê wezareta perwerdeyê ya Fînlandayê ve tê piştgirîkirin daku beşdarîbûna di warên kultûrî de pêşve bibe. Lêkolîna me beşek ji projeya *Pirzimanîti û pirrengî wek dewlemendi li meydana kultûrî – bihêzkirin û integrekirin bi rêya edebiyatê li welatên Skandinyayê* ye û alîkariya aborî ji wezareta

³⁹ One-third of the dictionary is already available online: <http://kaino.kotus.fi/kurmandzi/>

perwerdeyê ya Fînlandayê û Encumena Wezîran ya dewletên Skandinavyayê (*Nordiska Ministerrådet*) werdigire.

Armanca vê lêkolînê ew e ku ron bike ka çî edebiyata kurdî li welatên Skandinavyayê tê nivîsîn, wergerandin, weşandin û/yan belavkirin. Lêkolîn dê herwiha hewl bide zelal bike ka rewşa nivîskarên kurd li welatên Skandinavyayê çawa ye, ew çawa xwe digihînin xwandevevanan, çî têkiliya wan li gel nivîskarên din (yên kurd an ne-kurd) heye li welatê ku niha lê dijîn û hwd.

Ev rapirsî dê wek beşeke berhevkirina agahiyan were bikaranîn di raporeke li ser rewşa edebiyata kurdî de li welatên Skandinavyayê. Rapor dê herwiha pêşniyazan bo dezgehên kultûrî yên welatên Skandinavyayê pêşkêş bike derbarê ku çawa bikarin alîkariya edebiyata kurdî bikin û wê pêşve bibin.

Em ê bi awayekî giştî û bênav muamale li gel bersivên rapirsîyê bikin. Navên bersivderan di raporê de nayên belavkirin.

Ji niha ve gelek spas bo alîkariya we!

Silavên germ

Husein Muhammed

[email]

[telefon] (Fînlanda)

AGAHIYÊN PAŞXANEYÎ

Nav, ziman/zarava, temen, cins, bicihbûna li Skandinavyayê (ji kengî ve), welatê jê hatî

ROLA TE DI MEYDANA EDEBIYATA KURDÎ DE

1. Hûn çawa beşdarî pêşvebirina edebiyata kurdî dibin? (Bo nimûne, bi nivîsînê, wergerandinê, weşandinê, verastkirinê, fînansekirinê, belavkirinê yan kirînê?)

2. Hûn edebiyateke çawa dinivîsin, werdigerînin, diweşînin, dikirin yan jî verast, fînanse yan belav dikin? (Bo nimûne, edebiyata xeyalî yan zanistî, roman, kurteçîrokan, helbestan, kitêbên zarokan, kitêbên hînkirinê, şanoyan, kovaran, xêzikan, blogan, kitêbên dengî, vîdyoyan û hwd.)

3. Çend sal in ku hûn beşdarî edebiyata kurdî dibin, bo nimûne bi nivîsînê, wergerandinê, weşandinê, belavkirinê û/yan kirînê?

4. Hûn li kû û di çi rewşê de edebiyata kurdî dinivîsin (yan diweşînin, verast dikin, belav dikin, dikirin û hwd.)?

5. Hûn li kû berhemên xwe diweşînin yan ew li kû tên weşandin? (Bo nimûne, li herêmên kurdî, li welatên Skandinavyayê, li welatên din yên Ewropayê; wek kitêbên çapkirî, li ser Internetê, wek kitêbên dengî)

6. Hûn heqê nivîsîna (yan weşandina, verastkirina, belavkirina, kirîna) edebiyata kurdî ji kû peyda dikin?

JIYANA ROJANE YA NIVÎSKARÎ/WERGÊRÎ (Bêzêmet, xwe di ser vê beşê re biavêjin eger hûn ne nivîskar yan wergêrek kurd bin. Herin beşa bi sernavê “Pêşeroj û raman bo pêşxistinê”)

7. Gelo hûn tenê bi kurdî yan herwiha bi zimanên din jî dinivîsin (yan diweşînin, dikirin yan jî verast, fînanse, belav dikin)?

8. Hûn li kîjan welatê Skandinavyayê dijîn (yan dixebitin) û hûn ji kîjan parçeya Kurdistanê ne? Kengî hûn li welatekî Skandinavyayê bi cih bûne?

9. Gelo hûn li yek an çend welatan dijîn?

10. Gelo hûn bi tenê dixebitin yan wek komekê/tîmekê (dinivîsin, werdigerînin, diweşînin û hwd.)?

11. Têkiliyên we li gel nivîskarên din û/yan xwandevanên we bi çi awayî ne?

PÊŞEROJ Û RAMAN BO PÊŞXISTINÊ

12. Gelo astengên herî dijwar li ber nivîsîna (weşandina, kirîna, verastkirina, belavkirina) edebiyata kurdî çî ne? Gelo niha bi berhevdana li gel deh sal pêştir kêmtir an zêdetir asteng hene? Hûn bawer dikin ku rewş dê di salên 2020an de çawan be?

13. Gelo edebiyata kurdî çawa dikare were pêşvebirin? (Bo nimûne, bi nivîsînê, weşandinê, belavkirinê, balkişandina xwandekaran bo edebiyata kurdî?)

14. Gelo hinek tecrûbeyên biserketî hene ku hûn bawer dikin baş e bên dubarekirin an belavkirin?

15. Gelo tiştekî din heye ku hûn dixwazin bibêjin?

Ji kerema xwe, bersivên xwe bişînin

[email]

QUESTIONNAIRE (English)

INTRODUCTION

Hello,

My name is Husein Muhammed and I am conducting a survey on the Kurdish literature in the Nordic countries. The survey is ordered by Culture for All, a state-funded organization that promotes accessibility and inclusion in the field of culture. The survey is part of the project *Multilingualism and diversity as a resource in the cultural field – employment and integration through literature in the Nordic Countries* and it is funded by the Nordic Council of Ministers.

The aim of this survey is to find out, what kind of Kurdish literature is written, translated, published and/or distributed in the Nordic countries. The survey also aims at clarifying in what conditions Kurdish writers live in the Nordic countries, how they reach their readers, what kind of interaction they have with other (Kurdish or non-Kurdish) writers in their current country of residence etc.

The questionnaire will be used as part of information gathering for a report on the conditions of the Kurdish literature in the Nordic countries. The report will also make policy recommendations for cultural foundations in the Nordic countries on how to support and promote Kurdish literature.

Thank you in advance for your help!

Best wishes

Husein Muhammed

Email: XXXXXXXXX

Phone XXXXXXXXX

QUESTIONNAIRE FOR KURDISH WRITERS, TRANSLATORS, PUBLISHERS, LIBRARIES, CULTURAL FOUNDATIONS ETC. IN THE NORDIC COUNTRIES

BACKGROUND INFORMATION

Name, language/dialect, age, gender, Nordic country of residence (since when), country of origin

- if cited, the interviewee will be asked separately

YOUR ROLE IN THE KURDISH LITERATURE

1. How do you participate in promoting Kurdish literature? (For example, by writing, translating, publishing, editing, funding, distributing, purchasing?)

2. What kind of literature do you write, translate, publish, edit, fund, distribute, purchase? (For example, fiction or nonfiction, novels, short stories, poems, children's books, teaching books, plays, journals, newspapers, comics, blogs, audiobooks, videos etc.)

3. How long have you been involved in the Kurdish literature by, for example, writing, translating, publishing, distributing and/or purchasing it?

4. Where do you publish or where your books published? (For example, in Kurdish areas, in Nordic countries, in other European countries; as printed books, on the Internet, as audiobooks.)

5. How do you fund your writing (or publishing, editing, distribution, purchase) of Kurdish literature?

6. Do you write (or publish, edit, fund, distribute, purchase) only in Kurdish or in other languages as well?

WRITER'S DAILY WORKING LIFE (please skip if you are not a writer or translator of Kurdish. Jump to questions under the heading "Future and ideas for development")

7. Where and in what circumstances do work with Kurdish literature (for example write, publish, edit, fund, distribute, purchase) Kurdish literature? (For example, at home, as part of an organization, funded by an organization etc.)

8. Which Nordic country do you live in (or operate from) and which part of Kurdistan you are originally from? Since when have you settled in a Nordic country?

9. Do you live in more than one country?

10. Do you work (write, translate, publish etc.) alone or as a group/team?

11. What kind of interaction do you have with other others involved in the Kurdish literature?

FUTURE AND IDEAS FOR DEVELOPMENT

12. What are the most difficult challenges in writing (or publishing, editing, distribution, purchase) of Kurdish literature? Are there currently more or less challenges than a decade ago? How do you foresee challenges in the 2020th?

13. How could the Kurdish literature be promoted? (For example, writing, publishing, distributing, and attracting readers of Kurdish literature?)

14. Are there some success stories that you think would be useful to repeat or distribute?

15. Is there anything else you wish to say?

Please send your answers to

[email address]

رأپرسی (Sorani)

رأپرسی بۆ نووسەر، وەرگێڕ، چاپخانه، کتیبخانه و دەرگا کولتوورییه کانی کوردی له ولاته کانی سکاندینافیا

زاناریه پیشخانیه کان

ناو، زمان/شێوهزار، ته مه ن، زایه ند، نیشه ته جیبوون له سکاندینافیا (له که یه وه)، ولاتی که لی هاتوویت

دهورت له مهیدانی ئه ده بی کوردیدا

۱. ئایا ئیوه چۆن به شداری ده که ن له گه شه پیدانی ئه ده بیاتی کوردیدا؟ (بۆ نمونه به نووسین، وەرگێڕان، چاپکرن، بۆلاکردن یان به کرینی به رهه م)

۲. ئايا ئىۋە ئەدەبىياتىكى چۆن دەنوسىن، ۋەردە گېرن، چاپ دەكەن، يارمەتې داراپى دەدەن، بىلا دەكەن، دەكېرن؟ (بۇ نىمۇنە، ئەدەبىياتى خەيالى يان زانستى، رۇمان، كورتەچېرۇك، ھۇنراۋە، كىتېبى مىندالان، كىتېبى فېركردن، گۇفارى، رۇژنامە، بىلۇگ، كىتېبى دەنگى، فېدېۋ ۋە ھتد.)

۳. چەند سالە كە ئىۋە بەشدارىتان كوردوۋە لە ئەدەبىياتى كوردى دا، بۇ نىمۇنە، بە نوسىن، ۋەرگېران، چاپكېرن، بىلاۋكردن و / يان كېنەۋە؟

۴. لە كۆي و لە چى بارودۇخىكىدا ئەدەبىياتى كوردى دەنوسىت (يان چاپ، بىلاۋ يان پەيدا دەكەن)؟

۵. لە كۆي بەرھەمت چاپ دەكەيت يان بەرھەمەكانت لە كۆي چاپ دەبن؟ (بۇ نىمۇنە، لە كوردستان، لە ۋلاتەكانى سىكاندىنافيا، لە ۋلاتەكانى دىكەي ئورۇپا؛ ۋە كۆي كىتېب چاپ دەكېرن، لە سەر ئىنتېرنېت، ۋە كۆي كىتېب دەنگى)؟

۶. چۆن بودجەي نوسىن (يان چاپكېرن، بىلاۋكردن، كېرن) بۇ خۆت لە بواری ئەدەبىياتى كوردىدا داين دەكەيت؟

ژيانى رۇژانەي نوسەر/ۋەرگېر (بېزەحمەت، ئەمە تېپەرە ئەگەر نوسەر يان ۋەرگېرنى كورد نەبىت. بچۇ بۇ بەشى بە سەردېرى "دوارۇژ و پىشنىياز بۇگەشەپىدان")

۷. ئايا تەنيا بە كوردى ئەدەبىيات دەنوسىت (يان چاپ دەكەيت، بىلاۋ دەكەين، دەكېرت) يان بە ھەندىك زمانى دكەش؟

۸. له چی ولاتیکی سکندینافیا ده ژیت (یان کار ده کهیت) و خه لکی چی پارچه یه کی کوردستانیت؟ له که یه وه له ولاتیکی سکندینافیا نیشته چی بوویت؟

۹. ئایا ته نیا له یه ک ولات یان له یان یان چهند ولاتیکی ده ژیت؟

۱۰. ئایا به ته نیا یان له گه ل چهند که سیک / وه کوو گرووپیک کار ده یه کهت (ده نووسیت، وهرده گیریت، چاپ ده کهیت و هتد.)؟

۱۱. به چی شیوه په یوه نندی ده کهیت له گه ل نووسه رانی دیکه یان له گه ل خوئنه ره کانت؟

۱۲. ئایا قورسترین کیشه له به رده م نووسینی (یان وه رگپرانی، چاپکردنی یان بلاوکردنی) نه ده بیاتی کوردی چییه؟ ئایا کیشه کان نیستا به باروردی له گه ل ده سال پیشتر که متر یان زیاتر بوونه ته وه؟ ئایا پیشبینی ده کهیت چی کیشه له ساله کانی ده یه ی ۲۰۲۰ دا هه بن؟

۱۳. ئایا چون ده توانیت یارمه تی گه شه پیدانین نه ده بیاتی کوردی بکریت؟ (بو نموونه، به نووسین، چاپکردن، بلاوکردن، سهرنجراکیشانی خوئنه ر بو نه ده بیاتی کوردی؟)

۱۴. ئایا هیچ ته جرووبه بیکی سهرکه وتوو هه یه که پیت وایه سوودمه ند بیت دووباره بکریت یان بلاو بکریت؟

۱۵. ئايا شتتېكى دېكە ھەيە كە ھەز دەكەيت باس بىكەيت؟

تکايە ولامە کانتان بىنېرن بۆ

[email]

FRÅGEFORMULÄR (Swedish)

Inledning

Hej,

Mitt namn är Husein Muhammed och jag ska utföra en utredning över litteratur skriven på kurdiska språk i Norden. Utredningens beställare är Kultur för alla, en statligt finansierad organisation som främjar tillgänglighet och inklusion på konst- och kulturfältet i Finland. Utredningen är en del av projektet *Multilingualism and diversity as a resource in the cultural field – employment and integration through literature in the Nordic Countries*, som finansieras av Nordiska ministerrådet.

Syftet med utredningen är att undersöka vilken slags kurdisk litteratur skrivs, översätts, utges och/eller distribueras i Norden. Målet är också att utreda bl.a. under vilka slags villkor kurdiskspråkiga författare och översättare verkar under i Norden, hur de når sina läsare samt vilka slags kontakter de har med andra (kurdiska eller icke-kurdiska) författare i det land de bor i. En viktig del av rapporten är även att kartlägga behovet av litteratur för barn och vuxna skriven på eller översatt till kurdiska språk.

Frågeformuläret är en del av den bakgrundsinformation som samlas in för att sammanställa rapporten om den kurdiskspråkiga litteraturens situation i Norden. I rapporten inkluderas även rekommendationer för kulturaktörer och kulturadministratörer i Norden om hur kurdiskspråkig litteratur kan stödjas och främjas.

Alla svar kommer att behandlas anonymt och konfidentiellt. Om skribenten skulle vilja citera något svar kommer den citerade personen att tillfrågas.

Tack på förhand för din hjälp!

Kontakta mig gärna om du har några frågor.

Med vänlig hälsning,

Husein Muhammed

[Emailaddress]

[Telefonnummer]

FRÅGEFORMULÄR FÖR KURDISKSPRÅKIGA FÖRFATTARE, ÖVERSÄTTARE, FÖRLÄGGARE, BIBLIOTEK, KULTURORGANISATIONER OSV I DE NORDISKA LÄNDERNA

> om svar citeras görs det anonymt och endast efter samtycke

BAKGRUNDSINFORMATION

Namn, språk/dialekt, ålder, kön, nordiskt bosättningsland (sedan när), ursprungsland

DIN ROLL PÅ DET KURDISKA LITTERÄRA FÄLTET

1. Hur deltar du i främjandet av kurdisk litteratur? (T.ex. genom att skriva, översätta, ge ut, redigera, finansiera, distribuera, köpa in?)
2. Vilken slags litteratur skriver, översätter eller redigerar du, ger du ut, finansierar, distribuerar eller köper du upp? (T.ex. skönlitteratur eller facklitteratur, romaner, noveller, poesi, dramatik, serier, barnlitteratur, pedagogisk litteratur, bloggar, audioböcker, videor etc.)
3. Hur länge har du arbetat med litteratur på kurdiska språk, t.ex. med att skriva, översätta, ge ut, distribuera och/eller köpa upp kurdisk litteratur?
4. Var ger du ut dina böcker eller var är de utgivna? (T.ex. på kurdiska områden, i nordiska länder, i andra europeiska länder och i form av t.ex. tryckta böcker, på internet, som audioböcker)
5. Hur finansierar du ditt skrivande (eller förläggandet, redigeringen, distribueringen, inköpet) av litteratur på kurdiska språk?
6. Skriver du (eller förlägger, redigerar, distribuerar, köper in) litteratur enbart på kurdiska språk eller även på andra språk?

FÖRFATTARENS/ ÖVERSÄTTARENS VARDAG (vänligen hoppa över om du inte är författare, skribent eller översättare och fortsätt till rubriken "Framtiden och idéer för en utveckling av fältet")

7. Var och under vilka omständigheter arbetar du med litteratur på kurdiska språk? (T.ex. hemma, som en del av en organisation, på arvodesbasis, på stipendier eller finansierad av en organisation)
8. I vilket nordiskt land bor du i (eller verkar du från) och vilken del av Kurdistan kommer du ursprungligen från? Sedan när har du varit bosatt i ett nordiskt land?
9. Bor du i flera än ett land?

10. Arbetar du ensam (skriver, översätter, ger ut) eller som en del av ett team?
11. Hur samverkar du med andra personer/aktörer på det kurdiska litterära fältet?

FRAMTIDEN OCH IDÉER FÖR EN UTVECKLING AV FÄLTET

12. Vilka är de svåraste utmaningarna för en aktör på det kurdiska litterära fältet i Norden (t.ex. som författare, förläggare, redaktör, distributör eller uppköpare)? Är utmaningarna nu fler eller färre än de var för ett decennium sedan? Vilka tror du att är utmaningarna på 2020-talet?

13. Hur skulle den kurdiska litteraturen i Norden kunna synliggöras bättre?

14. Finns det några goda exempel, framgångsberättelser, som kunde upprepas och/ eller spridas?

15. Annat som du skulle vilja tillägga?

Vänligen skicka dina svar till:

[Emailadress]

